
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (222):

## Girtineke bêsûcane, berdewamkirina dizînan û ferzkirina vêrgiyan, qutkirina darine zeytûnê û şewtandina daristanekê, hilweşandina Zaretgeha "Şêxmûs Enzelî", pevçûnin













Bûyêrên ku ji çend heftan ve li herêmên bi navê "Mertala Feratê" û "Şaxa Zeytûnê" çêbûne, hîştin ku hebûneke ewlehî ye "Desteya Tehrîr El'şam (HTŞ)" li Herêma Efrînê peyda bibe, û bandor û desteserkirina Milîseyên ku serkêşên wan ji Turkmana û pirtir bi ser "Hikometa Dad û Geşepêdanê - Turkiyê" ve fere bibe, mîna: Firqit El'sultan Silêman Şah - Mihemed El'casêm (Ebû Emşe), Firqit El'sultan Mûrad - Fehîm Îse, Firqit El,hemze - Sêf Ebû Bekir..., li ser hesabê tunekirina hebûna Milîseyên "El'cebhe El'şamiyê" û hin din li herêmê, û herweha jî Anqerê guvaşa xwe li ser hemî giropên çekadar zêde dike, da ku ji her pêngaveke pêşerojê ku bixazibe bimeşîne re amede bin; Lê, bê ku rewşên giştiyane baş bibin an asta binpêkirin û tewanên ku di dermafê Kurdan de li Efrînê têne kirin dakeve.

**Ev jî binpêkirin û tewanin têvel in:**

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Li 2.11.2022an. Z, Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Mabeta" Hemwelatî "Faroq Ebdo Mihemed" ji xelkê Gundê "Emara", bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re girt, û ta niha bêsûcana bendkirî ye; Herweha hemwelatiyine Kurd en din jî hene bi heman tuhmetê daxwazkirî ne.

**= Werza zeytûna:**

**-** Milîseyên "Firqit El'sultan Mihemed El'fateh" ên ku "Doxan Silêman" serkêşiya wan dike, 10% li ser berhema zêtê zeytûna li Gundê "Me'imila" - Navça Reco ferz dike, û weha jî 50% li ser berhema malmewdanên hemwelatiyên ne li wir, ji bilî wê jî destdanîna li ser dora/1500/darên zeytûnê yên koçberine zorane, û bi ser de jî ferzkirina berefkirinê bi riya giropine ji karkerên pêve girêdayî. Û li Gundên "Kurkê Jorin û Jêrin" ên hevcîwar, ew 50% li ser berhema malmewdanên hemwelatiyên ne li wir ferz dikin.

**-** Dizîna berê /25/ darên zeytûnê yên "Hemîd Saro" ji xelkê Gundê "Kumreşê" - N.Reco, ji aliyê çekdarên Milîseyên "Firqit El'hemze" ve.

**-** Şelandina /10/ teneke zêtê zeytûna (heryek /16/ KG zêtê sade) ji reseniya /15/ teneke zêt (tevahiya berhema hemwelatî "Emîne Bîlal Umer" ji xelkê Gundê "Qizilbaşa" - Navça Bilbilê), ji aliyê Milîseyên "Lîwa'i Siqor El'şemal" ve; Divê were zanîn ku ew jinebî ye, bi tena xwe ye, û xizmet dê û bavê xwe yên temenmezin dike; Û wan milîseyan gef jî danê ku ewê dest dînin ser piraniya malmewdanên wê (1500 darên zeytûnê - îsal negirtîbûn), bi behaneya ku ew bi tena xwe ye.

**-** Milîseyan berine zeytûna ji (/35/darên Serxwebûn Ehmed Me'imo, /9/darên Xedîce Ehmed Seydo, /35/darên Hisên Ehmed Qawoq) ji xelkê Gundê "Kêla" - N. Bilbilê dizîn.

**-** Giropine mezin ji karkiran bi pêşengtiya çekdarine diz ji Milîseyên "Feyleq El'şam" (yên ku "Ebû El'nûr" li Gundê "Naza" - Navça Şera serkêşiya wan dike), berê zeytûna ji hezardaran -bi şev û ro- dizîn, jê (/50/dar ên "Henîf Xelîl", /125/dar ên "Ibrahîm Xelîl"), û berê jî alavên guvêşgeha zeytûna a koçberbûyê zorane "Ehmed Osman" -piştî ketina gund li Avdara 2018an. Z dizîn, û dest danîn ser avahiya wê û kirin stewlê çêlan, û paşê ji nû ve guvêşgeh amede kirin û xelk neçar kirin ku berhemên xwe yên zeytûna têde biguvêşin.

**= Qutkirina daran û şewatên daristanan:**

**-** Li vê dawiyê, Milîseyên "Siqor El'şemal" dora/400/darên zeytûnê yên koçberê zorane "Fewzî Umer" ji xelkê Gundê "Qizilbaşa" - N.Bilbilê ji kokê ve hilkirin, û herweha jî /7/darên "Emîne Bîlal Umer", bi ser de jî qutkirina /15/darên gûzê yên "Fewzî".

**-** "Berevaniya Sivîl li Efrînê" tekez kir ku tîpên wê, li 30.10.2022an. Z, şewatek li daristaneke nêzîk Gundê "Bilêlko" - N. Reco vemrand.

**= Hilweşandina zaretgeheke olî:**

Zaretgeha "**El'şêx Şêxmûs Enzelî**" ya olî û dîrokî li Başûrê Gundê "Gewenda" - N. Reco bêtirî carekê rastî tarûmarkirin, kolan û tevdanê hat, bi ser de jî qutkirina hemî darên daristana wê ya ihracê yên temenmezin, ji aliyê Milîseyên "Feyleq El'şam"ve, û roxandina gorên hin miriyan.

Û li Roja Înê 28.10.2022an. Z, giropeke çekdar ji nû ve teqînerek di hundir avahiya zaretgehê de teqand, di encamê de dîwarên wê şi'etîn û hilweşîn, û gorgeha wê jî tarûmar bû, piştî ku berê carekê hatibû çaksazkirin.

**= Bêserûberî û serberdayetî:**

**-** Li şeva Duşemê 31.10.2022an. Z, piştî ku hêzeke "HTŞ", ji bo lêgerîna li hin çekdarên daxazkirî, Gundê "Sariya" - Navça Mabeta basmîş kir, pevçûnin di navêna wê û çekdarên Milîseyên "Firqit El'muntesêr Bîlah" de -ên ku gund desteser dikin- derketin, û di encamê de hin endamên wan û sivîlekî anîndekirî birîndar bûn, û tirs kete nav sivîlan.

**-** Li 31.10.2022an. Z, makîna "Bîlal Ebû Welîd" - serkêşekî Milîseyên "El'feyleq El'sales(sisiyê)"- li nêzîk çateriya Gundê "Çema" - N.Şera rastî piroseyeke teqandinê hat, û di encamê de mir, û du peyên wî jî birîndar bûn.

Tu kabik li piş "lihevkirina bi Rijîma Sûriyê re" ya Hikometa Anqerê jê re dide defê nayê avêtin û tu hêvî li piş netên girêdan, li şûna wê ji Civaka Navdewletî tê xwestin ku pêngavine bilez bavêje û zextê li ser Turkiyê bike, ji bo gerantîkirina sîstem û aştiyaneya giştî û danîna rêgirekê ji binpêkirin û tewananan re li Efrînê, li ser riya dawîkirina dagîrkeriyê û vegera herêmê bo serweriya Sûriyê û rêvebiriya xelkê wê.

06.11.2022an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** "Doxan Silêman" serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Mihemed El'fateh ".

**-** Şewatek li daristaneke ihracê li nêzîk G. "Bilêlko" - N.Reco.

**-** Hilweşandina avahiya Zaretgeha "Şêxmûs Enzelî", li nêzîk G. "Gewenda" - N.Reco.

**-** Teqandina makîna "Bîlal Ebû Welîd" - yek ji serkêşên Milîseyên "El'cebhe El'şamiyê".